

Pîreka jîr û zana

Amadekirina:Nûşîn
Bêcirmanî
ji kevnatora kurdî

Dibêjin şahê bajarekî digel keça xwe di nava bajêr de digerîn. Li gastînekê mêrekî perîşan, bêmirês û cilqirêj dît. Şahê pozbilind tif wî mêrî kiriye. Keçikê got: "Bavo çima te tif wî mêrî kir?" heye ku ew mirovekî desteng û perîşan e! Şah lê vegerand " "Ma , çima çekên wî lewitî û gemarî ne?".. Keçê bersiv da "heye ev mirov bê jin e şahê min ". Şah bi dengê bilind pirsî ,ma pîrek mêran dikin mêr ?. Keçê bi dengê nazik lê vegerand, " Erê bavo, pîrek mêran dikin mêr". Şah engirî, û bi zirt ji keça xwe re got : " Min tu dayî vî mêrî bi jinî, de here here wî bike mêr, eger tu rast dibêjî. Keça xwe li wir danî û vejeriya qesra xwe. Keç hate mal, çekên xwe birin û durek jî kire bin zimanê xwe, ji mêrê xwe re got: Ka were heyran ! Ez bûme jina te, kanî mala te? çiyê te heye?.. Berê xwe dane mala mêr û derbasî xanî bûn, keçikê şande pey melayekî, mehra wan li hev birî, li wan bû sibe, jina wî berê xwe da bazarê, dura xwe firot, bêreke ji mêrê xwe re kirî û vejeriya mal, jê re got ev bêr ji te re ye, da ku sibe tu herî kar, çênabe tu li mal bê kar bimînî, teralî nema ji tere dibe, tu bûyî xwedî mal û jin.

Li wan bû sibeh, jina wî ew ji xew şiyar kir, bêra wî xiste destê wî û berê wî da cihê karkeran. Mêrik çû li wir ma ta êvarî bê sûde vejeriya malê, jina wî jê pirsî: "Ka te çi ji mala xwe re aniye? ". Mêrê wê bersiv dayê û got: "Bi Xwedê min tu tişt nanî, tu kar bi dest min neket". Roja din, dîsa wilo. Pîrekê got: " Wilo nabe, divê sibe tu bi karwan re herî Bexdayê. Jina wî ji serokê karwên xwest ku mêrê wê bi xwe re bibe. Serokê karwan jê re got: Emê 1500 perî bidinê. Jinikê got: Başê keko, sibe wê bi we re biçê. Jina wî bi lez vejeriya malê û ji

mêrê xwe re got : Sibe zû li cihê karwan be ,da tu bi wan re herî.

Bi tîrêja beyanê re, berê xwe da cihê karwan, ewî dewar ajotin û bi rê ketin, ta ku li wan bû şev, li ber bîrekê danîn da ku dewarê xwe av bidin. Serokê karwan got : Yê ku peyabe hundurê bîrê û dewla me dagire, emê 1000 perî pêdin , lê divê hûn zanibin yê ku dikeve vê bîrê ew venagere!!.. mêrê Xatûnê ji xwe re got : Çima ez nakevime vê bîrê? Eger ez vejeriyam, wê 1000 pere bibe para min, û eger ez venegeriyam jî, ezê ji gotgota jina xwe bi carekê re xilas bibim!!.. rabû wî ji serokê karwan re got: Ezbenî, ezê bikevim vê bîrê.

Rabûn, ew daxistin bîrê, dewlên wan dagirtin ta ku dewaran têr vexwar. Ji wan re got: Ka werîs ji min re berdî, da hûn min derxin... Hê werîs negihaye dest, dît ku beremek di qeraxê bîrê de vebû, mirovekî bi hêz ew kişande wê beremê, li dora xwe nerî hay lo, va bexçekî mezine, hemî darên fêkî ne, di nîvê bexçe de goleke avê heye û di wê golê de beqeke reş weke teniyê û pîrekeke bedew li kevya wê golê rûniştiye, ew mirovê bi hêz jê pirsî : Kuro ev beqa reş xweşikê yan ev pîreka ha?! Mirov ji xwe re ramand : "Bi Xwedê ker jî zane ku ev pîrek ji vê beqê xweşiktir e, heme bi Xwedê weke dibînim ez nabêjim". mirov got: " Ev beq ji vê pîrekê bi gelekî xweşiktir e"....!! Ji nişka ve dît ku ew beq peqiya û bû keçeke nazik û bedew, û ew pîrek bû beqeke reş. Mirovê bi hêz got: "Te xwe xilas kir û te em jî ji vê sergêjiyê xilas kirin, ji ber ev pîrek jina min bû û eva ku bû beqa reş sîhir jê re çekir û kire weke beqeke reş û xwe kire şûna wê de, divabû yekî ku rewşa wan nizanibe bibêje ev beq ji vê pîrekê xweşiktir e, vêce tu çi bixwazî ezê bi te dim. Mirov li dora xwe

D.R (5)